Xweamadekirin Bo Karesatan

14

Dr. Ebdulbaqî Mayî

Dîroka me Kurdan ji serhatiyên tehl u afatên giran pir e. Lewma xelkê me bi sal û zemanan ji bo ku xwe li tengavîyên giran qurtal bi ket stratecîyên taybet bi xwe saz kirine û her ji zarokan dest bi xwe amadekirina bi leş û derûnan diket. Ev êke li cem me siroştî ye û xelk pir li ser na fikirin. Metirsiya vê ewe ku mirovên me di astê tenahiyê de van stratec û tektîkan ji bîr bike.

Serhatiyên xelkê wesan diyar diken ku ev xwe amadekirine tiştek bi sanahî nîne. Li bajêrê New Orleans yê Emerîka Bakûr, sala 2005ê vi ber tofanek mezin keft. Karên rizgarkirina xelkê tûşbûyî hate rexnekirin. Salek ber tofanê govara zanistî "Natûre" nivêsek belav kir behsa metirsiya peydabûna tofanek wesan kiribû. Evê nivîsê bilindbûna astê ava Atlantî kiribû egerek giring ji bo hisab kirina peydabûna evê tofanê. Di ser hindê re xwe amadekirin ne di cih de bû û harîkarî ne dilxaz bû. Aşkira bû ku serokê dewletê û berspisyarê bilind direng cabên xwerizgarkirinê dane xelkê xwe. Xelk helbet hez na ket mal û milkên xwe bi cih bi hêlit û qesta revê biket, eger çi biryarên bilind li ser wan fermanan ne det. Xwedan biryarên bilind jî ageh li raportên berî salekê nebûn.

Rêveberên dewletê bi evî rengî ne şiyan demildest karê xwe encam biden da xelkî ji tofanê rizgar biken. Deynana serok û rêveberan lêkdana mirovên bispor û encamdana kar û xebatên pêtivî gîro kirin. Li dûv govara "Natûre" ev pirse problemek struktûr bû. Çunku berpirsên siyasî li ser raportên lêkolînên zanstê agehdar ne bûn, êdî neşiyan rolê xwe bi dirustî bi bînin û xizmeta xelkî bi rengek pêtivî bikin.

Her çende daxaza û hîvîyên me ewn ku çu caran xelkê me êdî viber çi afat û tofanan ne kevît, belê em dizanîn gefên şer û zordarîyê hêşta li dewr û berên me pirin. Lewma divêt em evî demî hêşta ji berê pitir hişyar bîn û xwe bi rengek zanistî û nûxaz ji bo serhatîyên tehl û nexweş amade bikin. Ji kerema Xwedê noke me pispor û şehreza yên derûnnas hene dikarin van babetan rêkbêxin û çare bikin. Pişka Saxlemiya Derûnî ya zarokan li Kolîca Nojdarîyê li Zankoya Duhok dikare rolek giring di evî babetî da bi bînît, eger karbidest û serokên me ji xeletîyên xelkî bi xwe mifay wergirin û her noke xwe ji bo rojên giran amade bikin û li raport û lêkolînên zanistî agehdar bin.